hejmar 29 bihar 2001

KURMANCÎ

rojnameya taybetî ya Enstîtuya Kurdî ya Parîsê li ser pirsên zaravê kurmancî

Min ev nivîsî ne ji bo sahibrewacan
Belkî ji bo biçûkêd Kurmancan

Ehmedê Xanî
(Sedsala XVII)

Civîna Biskops Arno
8 - 14 nîsan 2001

Civîna 29 emîn a Kurmancî *di navbera rojên 4-8/04/2001 an de li Xwendegaha Bilind a Biskops Arno, li Swêdê civiya. Beşdarên civînê li ser nîşanên trafîkê, stranên folklorî (strana Gewre Xatûn), xwarin (penîr), devoka Kurdên Qefqasyayê, devoka Botan, ferhenga partî-kurdî, peyvên kurdî di zimanên cîran de xebitîn...*

Di vê civînê de Salih Akin (Xerzan), Mistefa Aydoğan (Mêrdîn), Lutfî Baksî (Xerzan), Michael Chyet (Parîs, Waşîngton), Elîşêr (Wan), Rojan Hazim (Hekarî), Mahmûd Lewendî (Qerejdax), Emîn Narozî (Batman), Kendal Nezan (Diyarbekir), Selam Nûman (Qamişlo), Cemal Onursal (Cizîr), Zinar Soran (Dêrik), Behroz Şucaî (Kotol), Newzad Şukrî (Duhok), Têmûrê Xelîl (Rewan) û Reşo Zîlan (Agirî) beşdar bûn.

Encamên civînê di vê hejmara Kurmancî de tên belav kirin.

Devoka Kurdên Qefqasyayê

Amadekar : Têmûrê XELÎL

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
alkan: pêl, pêlên deryayê	dalga	vague	a wave
aşûn: aşûjin, arşûjin, asûjin	çuvaldız ipi	fil de grosse aiguille de sacs à grains	coarse thread for patching up grain sacks
axlêve: dema baharê axira zivistanê xilaz dibe û tiştên nû jî hela şîn ne bûne	ilk bahar başlangıcı, kış zahiresi bitıp kırların henüz yeşermediği geçiş dönemi	premiers jours du printemps; période pendant laquelle les réserves d'hiver s'épuisent alors que l'herbe n'a pas encore poussé	the first days of spring, lean period when the winter stores are exhausted but the grass is not yet grozing
axûn	tutku	passion, frénésie, emballement	passion, frenzy, excitement
ketin axûnê	kendini kaptırmak, bir şeyi tutkuyla yapmak	se passionner, s'emballer	to be attacted or excited, to be carried away
bativk: kînorê ku li ser sûretê merivan çê dibe û bi avî ye yan jî hewa tê de heye. Wexta ew diteqe, dibêjin "ava rûyê wî qetiya". Ango êdî hew şerm dike. peq, pequlk, avzelêlk	yüzde çıkan iltihaplı çıban	furoncle	furuncle, boil
belapêjgar: berhingar, belakirr, belafiroş	belalı, kavgacı	belliqueux, querelleur	bellicose, warlike
berbihêr: bi tehemûl, kesê bi sebir	sabırlı, tahamüllü, hoş görülü	persévérant, patient, tolérant	persevering ; patient ; tolerant
berxweş: qasik an amaneke ku ne tijî ye, ne jî nîvî ye, di navbera wan de ye	yarıdan fazla dolu ama tam dolu almayan	un récipient rempli à moitié	a half filled vessel
beyanî: hov, wehşî	vahşi, yabani	sauvage	wild
betreng: bedreng: reng lê nemaye, reng lê çûye	solgun, uçuk renkli	pâle, incolore	pale ; colourless
betave bûn: beto vebûn	aniden kaybolmak	s'égarer, disparaître soudainement	to get lost ; to disappear suddenly
biramak: birayên ji dayîkekê lê ne ji bavekî	aynı anne ve farklı babalardan olan kardeşler	demi-frère ou demi-soeur, enfants nés d'une même mère et de pères différents	half-brother or half sister having the same mother but different fathers
çêt: di navbera cûcikê û varik de	civciv ile piliç arası tavuk yavrusu	jeune poulet, quelques semaines plus âgé que le poussin	spring chicken ; a few weeks older than a baby chick
çir: tenê ji şekir re tê gotin; "çirek şekîr bide"	parça (şeker)	morceau de sucre	piece or lump
danavî: kulecergî/ hinavkutî kirin	canından bezdirmek, usandırmak, acı çektirmek	épuiser, rendre malade, exaspérer, tourmenter	to sicken, to exasperate, to exhaust
dapalandin: palandin, dawerandin, dawerivandin, darivandin	süzmek	égoutter, décanter	drain, strain
den: reng ji bo qumaş, boyax	boya, boya küpü	teinte, couleur	complexion ; colour
den kirin, avêtin denê	boyamak, boya küpüne batırmak	teindre	to dye
derc kirin	anlamak	saisir, comprendre	to understand
deya: badihewa, vala	boşuna, nafile	vain	vain
deya çûn	boşuna gitmek, nafile çırkmak	être vain, s'avérer vain	to be vain ;
dibûrî: dilsar, bêşewat	soğuk, ilgi ya da yakınlık göstermeyen	froid, réservé, peu affectueux	cold ; reserved ; not affectuous
dilq: rol; ew di filmê de di dilqê sereke de dilîze	rol	rôle	role
dolîdan: hêlekan, hêlan, hêleçan, hêlik	salıncak	balançoire	swing (for playing on)
êgin: jina ku kar ji destê wê tê, jêhatî ye	becerikli, maharetli, çalışkan kadın, hamarat	travailleuse, diligente, agile	hard-working, diligent
êginî	çalışkanlık, becerıklilık	diligence	diligence
gîro: mijûl; ew bi karekî ve gîro ye	meşgul	occupé	busy
gîro kirin	meşgul etmek	occuper	to be busy or occupied
gono: kesê ku behsa wî tê kirin, lê naxwazin, ew bizanibe, ku derheqa wî de xeber didin. Yê gono hat, yê gono got...	kendisinden bahsedilen fakat farkına varmasın diye adı zikredilmeyen	personne dont on parle sans citer sans nom pour qu'elle ne s'en rende pas compte, untel	a person being talked about without being named to prevent them from being aware, so-and-so
govek	göbek	1) nombril; 2) génération	1) navel ; 2) generation
guhbel: (mecazî): xinzîr, beraz, muxbîr, casûs	casus, muhbir	espion, indic	spy
hahanga: ha anka, ha niha	hemen; derhal	tout de suite	immediately, at once
girgîn	hidetli, ateşli, aktif	dynamique, vif, emporté, qui a le sang chaud	dynamic, lively, hot blooded
heytehol: şayî bi heytehol derbas bû	tantana, debdebe, azgın	faste, pompe	pomp, display, magnificence
heywangeh: eywan	ayvan, salon	hall, salon	hall, lounge
hêlan: mertebe, derence	derece, düzey	degré, rang	degree, rank
hêle: bêqusûr, lihevhatî; merivekî hêle ye, ango bê kêmasî ye, xerxwaz e	mükemmel, dört-dörtlük, kusursuz	parfait, sans défaut	perfect ; faultless
hêvşandin: paşdestkirin	tasaruf etmek, esirgemek	épargner, économiser	to save ; to economise
hilgê: hilge: çûyina li zozanan	yaylaya çıkma	montée vers les alpages	going to the high summer pastures
dagêr: dager, vegera ji zozanan	yayladan inme	descente des alpages	coming down from the summer pastures
hoç: balolk, balîlûk	dürüm	rouleau, sandwich	roll, sandwich,
kastîn: ji bo se û kûçikan	inlemek	gémir	to groan, to whine

kelefe: mal, gund yan bajarê hilweşiyayî, kavil, xirbe, dêris, wêran	viran, yıkıntı	ruine	ruins
qoş: qoşî, qoşme: beza hespan; ketine qoşê	at yarışı	course de chevaux	horse race
kevezan: gopalê xemlandî yê hêzeran	baston	canne (de bambou)	cane (of bamboo)
hêzeran	bambu	bambou	bamboo
kîp: gelek di ber hev de; em di şahiyê de kîp rûniştîbûn	sımsıkı	étroitement, très serré	very tight, squeezed
kurn: cirna mezin a avê	kurna	bassin d'eau en pierre	stone water basin
lêpok: berdevk, yê ku pê qeşmerî tê kirin	palyaço	clown, pitre	clown
megîran: mehgiran, nebîran, nagîran: jina ku ducanî ye û dilê wê diçe xwarinekê	aşermek	se dit de femmes enceintes qui ont envie de	describes pregnant women's whims or desires
meke: lazût, gilgilê stembolî	mısır	maïs	corn, maize
mêşindar: nîşandar	nişancı	tireur	sharp-shooter
nivatin: mersiye gotin, stranên şînê gotin	ağıt yakmak	chanter une élegie	chant an elegy
parça dil: hêrs, kela dil: parça dilê wî danî	öfke	colère	anger
pelepistûkî kirin: xwe pê şîrîn kirin, melaqî kirin	kendisini sevdirmek	faire du charme; se faire aimer	to be attactive ; to make oneself loved
peranî: revd: peraniya guran	sürü (kurt, it, vs)	meute (loups, chiens)	pack (wolves, dogs)
perseng: berbend, perde, perwa; persenga devê wî tune, ango çi tê ber devî wî dibêje. Bêperseng	pervasız, münasebetsiz	impertinent	impertinent
pînc	tahrik, kızıştırma	incitation	incitement
pînc kirin, pînc dan: nav tê dan	tahrik etmek, kışkırtmak	inciter, exciter, pousser	to incite; to excite; to egg s.o. on
qaşûrk: qelpîk: hûrikên ku ji ber birîna daran dimînin	kereste kırıntısı	copeau	cutting (of wood), chip
qeşirandin: çavê min naqeşirîne	ayırt etmek, kestirmek, farkına varmak	distinguer	to distinguish
qol: îmza	imza	signature	signature
rêj: bi bereket; erdê rêj	bereketli, verimli	fertile, productif	fertile, productive
rozgar: 1) aqûbet, nesîb, qeder; 2) dewran	1) talih, kısmet, kader; 2) zaman, çağ	1) destin; 2) époque	1) destiny; 2) epoch
sarîk: derdanê ji şûşe ku şivan mastê xwe dikinê	çobanların yoğurt ya da sulu yemeklerini koydukları camdan kap	recipient en verre dans lequel les bergers mettent du yaourt, des boissons ou des plats liquides	a glass receptacle herdsmen use for keeping yoghurt ; drinks or liquid dishes
nanê sayî: nanê ziwa, tenê nan	sadece ekmek, kuru ekmek, yavan ekmek	du pain sec, seulement du pain	dry bread ; just bead on its own
semer: sed mî (tenê ji miyan re tê gotin) semerek pez: sed pez	yüz koyun	troupeau de 100 moutons	herd of a hundred sheep
sîs: çîl sipî, piranî ji miyan re tê gotin	bembeyaz	blanc, tout blanc, albinos	white ; completely white ; albino
soron: çilek, nefsek (tenê ji pisîkê re tê gotin); pisîka soron: pisîka çilek	obur (kedi)	glouton (chat)	glutonous (cat)
sût: rengê şîn	mavi	bleu	blue
telalok: kuçikê agir, ku dadidin û di ser re banz didin yan li dorê direqisin	etafında oynanan ateş ocağı	bûcher, feu autour duquel on danse	bonfire
temetîsk: tametîtk: xwarinên xweş	güzel yemekler	mets fins	fine foods ; delicatessen
terewil: hemû heywan	hayvanlar	animaux	animals
teyrede: tilûr: hemû teyr û çûk	kuşlar	oiseaux	birds
nanê tisî: nanê tisî, bê pêxwarin, “nanê tisî pê fetisî”	kuru ekmek, yavan ekmek	pain sec (sans boisson)	dry bread (without drinks)
tolan: holika kûçikan	it ini	chenil	kennel (of a dog)
tomik: tar; mişk dikevine telikê û nikarin jê derên, meriv jî dikevine tomikê	tuzak, hapis	piège, cachot	trap ; prison cell
toxavk: mastê bi rûn; to	sütün üzerinde oluşan çiğ kaymak	crème formée sur le lait	cream on the top of milk
turuş: curet, cesaret	cüret, cesaret	courage, audace	courage ; bravery ; daring
tûzîk: gede	çocuk, oğul	fils, rejeton	son, offspring
filankes xwe nagire bê şahiya me di dewsa xwe de tûzîkê xwe dişîne	şenliğimize gelmiyor, yerine oğlunu gönderiyor	un tel ne vient pas à notre fête il envoie à sa place son rejeton	s.o. is not coming our party and is sending his offspring in his place
xîzge, xîzgeh	kumsal	grève, sablonnière	sandy place, send pit, beach
zarî bûyîn	dili dönmemek, konuşmadan tutulmak	avaler sa langue, rester bouche cousue, ne pas souffler mot	to swallow “one's toungue” ; to keep mum ; not to breathe a word
zendegirtî: ecêbmayî, zendemayî, şaşmayî	şaşkın, hayret içinde olan	stupéfait, sidéré	stupified ; thunderstruck
zûkîn: zûrîn	ulumak	hurler	to howl
zûrbûn: zilbûyin	hayretten donup kalmak	rester bouche bée, être sidéré, épaté	to be speechless ; astounded
agûr	tuğla	tuile, brique en terre cuite	tile ; baked brick
çingil: reşe, şeybûk	korkuluk	épouvantail	scarecrow
gicûce: curekî keviran e, gilover e	iri ve yuvarlak inşaat taşı	grosse pierre ronde de construction	large round stone used for building
kaxçîn: xweliya ku jê kûzika çêdikin	kil	argile	clay
pêpes kirin: binpê kirin, xistin bin piyan	ayak altına almak, ezmek	fouler aux pieds	to trample underfoot
pirçûyê xwe kirin: lêva xwe daliqandin, lêvşor bûn	surat asmak	faire la tête, bouder	to sulk
seqirandin: bêdeng kirin	yatıştırmak, dindirmek	calmer, tranquilliser	to calm ;
seqirîn: guhê min seqirî	dınlenmek, yatışmak	se reposer, se calmer	to rest ; to calm down

Peyvên kurdî-îranî di zimanên cîran de

Di zimanê tirkî de (IV)

Amadekar: Reşo ZÎLAN
Behroz ŞUCAÎ

	fransizî	**îngilîzî**
hafta: *hefte, heftî*, ***far:*** hefte, ***peh:*** hefteg	semaine	week
ham: *xam, xav*, ***far:*** xam	brut, immature, vert	raw, immature
han: *xan*, ***far:*** xan, ***peh:*** xan	caravansérail	caravanserail
hane: *xane*, ***far:*** xane, ***peh:*** xaneg, xanîg, ***part:*** xanîg	maison	house
hanedan: *xanedan (=binemal)*, ***far:*** xanedan	(1) famille; (2) dynastie	(1) family ; (2) dynasty
harç: *xerc*, ***far:*** xerc	mortier, plâtre	mortar, plaster
harman: *xerman (=bênder)*, ***far:*** xermen	aire de battage	winnowing floor
hasta: *xeste*, ***far:*** xeste (=westiyayî), ***peh:*** xesten (=birîndar bûn)	malade	sick, ill
hastane: *xestexane, xeste*, ***far:*** xestetxane	hôpital	hospital
hatun: *xatûn*, ***far:*** xatûn, ***suxdî:*** xwatîn	dame	lady
havan: *hawin, hewan, hewing*, ***far:*** haven, ***peh:*** hawen	mortier	mortar
haya: *heya (=gunik)*, ***far:*** xaye, ***peh:*** xayik, hayik	testiculle	testicle
hayhuy: *hayhûy*, ***far:*** hayhûy	tumulte, confusion	tumult, confusion
hem: *hem, him*, ***far:*** hem	ainsi-que	as well as, and
hemdert: *hemderd, hevderd*, ***far:*** hemderd	compagnon d'infortune	companion of misfortune
hemşehri: *hemşehrî, hemşerî* ***far:*** hemşehrî	concitoyen, originaire de la même ville ou région	fellow citizen ; compatriot
hemşire: *hemşîre*, ***far:*** hemşîre	infirmière	nurse

hendek: *xendeq*, **far:** xendeq, kende	tranchée, douve	ditch, trench
hengame: *hengame*, **far:** hengame	vacarme, tumulte, tapage	tumult, uproar
her: *her*, **far:** her	chaque, chacun	every, each
herrü: *ya herrû ya merrû: ya hero ya mero*	ça passe ou ça casse	to make or break
hezaren: *hezarreng*, **bot:** delphinium consolida	delphinium, dauphinelle, pied d'alouette	delphinium
hır: hır çıkarmak: *xirûcir*	querelle, dispute	dispute, quarrel
hirbo: *xirpo*	grossier, brute	booby, lout, clumsy boorish fellow
hiç: *hîç (=qet)*, **far:** hîç, **peh:** hêç	rien, aucunement	nothing, none
hoca: *xoce*, **far:** xwace	maître	master
hodbehot: *xwe bi xwe*, **far:** xwud be xwud	soi-même	one's self
horoz: *xoroz (=dîk, dîkil)*, **far:** xurûs, **peh:** xiros	coq	cock
hoş: *xweş, xoş*, **far:** xweş, xoş	plaisant, agréable	pleasant, agreable
hor: *xor, xwar, xar, xwehr*, **far:** xwar, **peh:** xwar	méprisable	despicable, contemptible
hoşaf: *xoşav, xweşav*, **far:** xweşab, xoşab	entremets de fruits cuits au sirop	stewed fruit with plenty of juice
hoşbeş: *xweş baş, xweşbêş*, **far:** xoş baş	conversation amicale	friendly chat, friendly discussion
hunhar: *xwînxwar*, **far:** xwînxwar	sanguinaire	blood thirsty
hunriz: *xwînrêj*, **far:** xwînrîz	sanglant, qui fait verser du sang	bloody, causing blood-shed
hurda: *xurde*, **far:** xurde, **peh:** xortek	feraille	scrap metal
hurdahaş: *hûrûxweş, hûrûxiş, hûrxaşan*	vermoulu, en pièces	worm-eaten ; in pieces
huy: *xûy*, **far:** xwûy	caractère, habitude	character ; habit, temperament
hüner: *huner*, **far:** huner, **part/peh:** huner	art, talent, habilité, dextérité	art, skill, talent, ability, dexterity
hünkar: *xwînkar, xunkar*, **far:** xunkar, xûndger	souverain, sultan	sultan, sovereign
incir: *hêjîr, hejîr*, **far:** encîr, engîr, encîl	figue	fig
ibrişim: *hevrişim, hevirmiş*, **far:** ebrîşm	soie	silk
işkence: *şkence*, **far:** şkenc	torture, sévice	torture
kaftan: *xiftan, xeftan*, **far:** xeftan	cafetan	kaftan
kahraman: *qehreman, qareman*, **far:** qehreman	héros	hero
kahkül: *kakul*, **far:** kakûl	mèche de cheveux	lock of hair
kalender: *qelender*	bohème, personne non conventionnelle	bohemian ; unconventional person
kalleş: *qeleş, qelaş*, **far:** qellaş, kellaş	traître, déloyal	untrustworthy ; treacherous
kam: *kam*, **far:** kam	désir, souhait	desire, wish
kama: *qeme*, **far:** qeme	poignard	dagger
kart: *qert*	vieilli, endurci, dur	hard, toughened, aged
kelek: *kelek*	radeau	raft
kelepçe: *kelebçe, kelemçe*, **far:** kelepçe	menotte	handcuff
kelle: *kele, kelle*, **far:** kelle	tête	head
kellepaçe: *kellepaçe (=serûpê)*, **far:** kellepaçe	plat de tête et pieds de mouton	a dish of sheeps trotters
kem: *kêm*, **far:** kem, **peh:** kem	1) mauvais, malicieux; 2) peu, défectueux	1) bad, evil, malicious; 2) few : defective
keman: *keman, kevan*, **far:** keman, **peh:** kemançe: *kemançe, kemençe*, **far:** kemançe	petit violon à trois cordes	small violin with three strings
kement: *kemend*, **far:** kemend, **peh:** kemend	lasso	lasso
kemer: *kember, kinber, kemer, kimer*, **far:** kemer	ceinture	belt
kenar: *kenar, kinar*, **far:** kenar, **peh:** kener	côté, bord	side, edge, border
kene: *gene*, **far:** kene	tique (du bétail)	tick (on animals)
kenger, kengel: *kenger, kengir, kereng*	chardonnette, artichaut sauvage	cardoon, wild artichoke
kepçe: *kepçe, kemçe*, **far:** kebçe, kefçe	louche	ladle
kepek: *kapek, kepek, kapik*, **far:** kepek	son	bran
kereste: *kereste*, **far:** kereste	bois, planche, matériau	wood ; timber, plank
kereviz: *kerewîz, kerefs, kerewiz*, **far:** kerefs, keresis	céleri	celery
kerhane: *kerxane*, **far:** karxane	bordel	brothel
keriz: *karêz, kerîz*, **far:** karîz	crédule,	credulous
kervan: *karwan, kerwan*, **far:** karvan	caravane	caravan
kervanseray: *karwansera, kerwansera*, **far:** kervansera	caravansérail	caravanserail
kese: *kîse, kîs, kîsik*, **far:** kîse	1) bourse; 2) sac, pochette	1) purse; 2) bag
kesek: *kesek, kersek*	botte de terre	clod, lump of earth
keşkek: *keşke*, **far:** keşkek	plat fait de blé bouilli avec de la viande	a dish of wheat stewed with meat
keşkül: *keşkol*, **far:** keşkûl	sébile	beggar's cup
keşmekeş: *kêşmekêş*, **far:** keşmekeş	désordre, trouble, grande confusion	disorder, great confusion
kete: *kade*	galette faite avec de la farine, du beurre et des oeufs	a kind of pancake
kevgir: *kefgîr*, **far:** kefgir	écumoir	skimmer, perforated ladle
ki: *ku, ko, ke*	que, qui	that ; who
kil: *gil*, **far:** gil	argile	clay
kilim: *kilîm*, **far:** kilîm, gilîm	kilim	kilim
kin: *kîn*, **far:** kîn, **peh:** kên	haine, grief	hatred, grudge
kindar: *kîndar*	vindicatif, rancunier	vindictive
kirikit: *kerkît, kergît*	peigne d'un métier à tisser	comb of a loom
kişmiş: *kişmîş, kişmiş*	variété de raisin sans pépin	kind of seedless raisin (smaller than sultana)
kizir, gizir: *gizîr*	lieutenant du chef de village; dignitaire	assistant headman
korunga: *korîgan, qorîngan*	sainfoin	sainfoin
köçek: *koçek*, **far:** kûçek	danseur, danseuse	dancer
köfte: *kifte, kufte*, **far:** kifte	boulette de viande	meat balls
kör: *kor*, **far:** kûr, **peh:** kor	aveugle	blind
köse: *kose, kûse*, **far:** kose	imberbe	beardless
köstek: *kostek*, **far:** kûstik	1) chaîne de montre; 2) chaînes, fers	1) watch chain; 2) fetter, hobble, chains (for prisoners)
köşe: *goşe, koşe*, **far:** gûşe	coin, angle	corner, angle
köşebent: *goşebend*	lame de fer pour fixer les coins	iron hook for fixing corners
köşk: *koşk, koçk* **far:** koşk	villa, pavillon	villa, house
kötek: *kotek, kutek*, **far:** kotek	bastonnade, action de battre	a beating, the act of beating or cudgeling
küçük: *kiçik, qiçik (=biçûk)*, **far:** kûçek	petit	small, little
kükürt: *gogird, gûrd, kifrît*, **far:** gûgird	sulfure	sulphur
külah: *kulah, kuleh*, **far:** kûlah	chapeau conique en feutre, bonnet	conical hat or cap
külünk: *kuling, kuleng*, **far:** kuleng	pioche	pick
küm: *1) kom, kûm; 2) gom*	1) amas, tas; 2) bercail	1) heap; 2) small sheep fold
kümbet: *gumbed, gunbed, kumbed*, **far:** gunbez, gunbed	dôme, voûte, coupole	dome, vault, coupola
küncü: *kuncî*, **peh:** kuncît	sésame	sesame
küp: *kûp*	jarre	earthenware jar
küşne: *kuşne, kizin*	variété de vesce	a kind of vetch (given as folder to oxen)

Hinek lîstikên gelerî

Amadekar : Selam NÛMAN

Lîstikên li derve

Çirr, birr, topşeq, birranê
Çavgirtînk
Tûş
Nikilkê
Xeta
Hingilyo
Qaç
şepiya (goga) qehfikan
Eskerê heval-heval
Ferşanê, tefşok
Kab
Xar

Lîstikên li hundir

Navê
Girrê devan
Fincan
Gustîlk
Heftok
Reci´
Dam
Nehberk
Sêberk
Tilîqûnk

LÎSTIKÊN LI DERVE

Tûş

Ev lîstik bi şev tête lîstin û hola wê gelekî fireh e; taxek (semtek) yan du tax e, gorî lihevkirinê ye. Lîstik ji ber dîwarekî "niqê" dest pê dike. Berî birra Ayê herin xwe veşêrin birra Bê kesekî beza ji nav xwe hildibijêrin û dikin bûk. Piştî qasekê birra Bê dest pê dikin gazî dikin, dibêjin: "Bûka mîra hat, hat....Qazî, miftî beledî hat, hat" û diçin bi hev re li kesên Ayê digerin. Heger çavên wan bi kesekî ji Ayê ket wê biqîrin, bêjin: Tûş û bûka wan dest pê dike baz dide vedigere "niqê", dîwarê ko ji ber hatibû. Dema ko birra Ayê dengê Tûş dibihîsin pey bûkê dikevin, hewl didin wê, berî bigihîje dîwar bigirin. Heger birra Ayê bûk girtin ewê piwanekê bigirin û careke din herin xwe veşêrin, ya na ew ê têkevin şûna birra Bê. Heger birra Bê kirin nekirin kesek ji birra Ayê nedîtin niqteyekê winda dikin û careke din birra Ayê diherin xwe vedişêrin.

Xeta, Malikanê, Kulî-kulî, Çolanê, Teytok

Ev lîstika ha jî navnetewî ye. Du mirov yan du birr dikarin bi xetayê bilîzin.
Awayê wê li nik me bi vî rengî bû: A û B dilîzin. A dest pê dike dilîze. Divê ji çargoşeya yekê dest pê bike, qehfikê xwe bavêje çargoşeya yekê û xwe di ser re çeng bike û bi nikilkê (li ser lingekî) here ya 2an û 3an, û paşê bi herdu piyan here 4an û 5an, 6an bi nikilkê û 7an û 8an bi herdu piyan, û bi vî awayî vegere heta 2an, rahêje qehfikê xwe, xwe di ser 1ê re çeng bike û ji xetayê derkeve. Vêca ew ê qehfikê xwe baveje 2an, qehfikê wî divê bikeve nav çargoşeyê û nere ser xetê, heger qehfik bikeve ser xetê dişewite. Dema qehfik digihîje 4an divê mirov bi nikilkê here heta 6an. Heger qehfik nekeve çargoşeyê dor dibe ya lîstikvanê din, B. Heger dor vegeriya A, ew ê dîsa qehfikê xwe bavêje çargoşeya ko tê de şewitî bû. Piştî çargoşeya 8an lîstikvan ji xetayê, ji aliyê 7an û 8an, derkeve û qehfikê xwe bavêje çargoşeya yekê, heger qehfik li çargoşeyê bikeve ew çargoşe li lîstikvanê din qedexe dibe, divê lingê wî pê nekeve.

Hingilyo, Pilîtanê, Qîtik, Darqîtik, Çiling

Ev lîstik bi darekî mezin qasî kaşoyekî û darikekî biçûk qasî hostekê têtê lîstin. Du alî dilîzin, her alîyek ji 2 ta 5-6 lîstikvanan e. Lîstik du beş e.
Beşê 1ê:
Birra Ayê li ber du kevirên biçûk dest pê dikin. Her yek ji wan darikê biçûk datîne ser herdu keviran û bi darê mezin lê dide. Birra Bê ko li holê belav dibin, hewl didin darikê biçûk li hewayê bigirin, heger girtin dê ew kesê lê xistiye bişewite û bibe dora kesekî din ji birra Ayê. Heger negirtin û darik li erdê ket ew ê yek ji birra Bê darik ji cihê ko lê ketîye bavêje herdu keviran. Heger darik bi qasî dirêjahiya darê mezin nêzî herdu keviran be ew kesê birra Ayê yê li darikê biçûk dabû dişewite. Dema kesê ji birra Bê darik davêje herdu keviran kesê birra Ayê, yê li darikê biçûk dabû li ber keviran dimîne û hewl dide ko li darikê biçûk bide (berî bikeve erdê). Heger lê da û darik bi hewayê ket û hate girtin ew ê bişewite. Heger na ew ê qonaxa(mesafeta) navbera darik û herdu keviran bipîve (Pîvan darê mezin e) û çend dar derkeve ew ji birra Ayê re weko niqte (piwan) dihesibin.
Beşê 2an:
Niqtên kîjan birrê pirtir bin ew dest pê dikin, her yek ji wan sê caran li darik didin. Ji ber herdu keviran dest pê dikin. Darik divêt ramedandî li erdê be û lîstikvan bi darê xwe li guhê darik dide ko bipengize û li hewayê ta jê bê lê bide. Mafê her lîstikvanekî heye ko sê caran mihawele bike darik ji erdê rake. Dema birra Ayê (em ê bêjin ko niqteyên birra Ayê pirtir bûn) karên xwe diqedînin birra Bê dest pê dikin ji cihê dawî yê ko darik lê ketîye, yek bi yek û ber bi herdu keviran bazdidin û bi bazdanê re dibêjin Hingilyoooooo bê ko bihna xwe berdin. Herdu birr bi hev re bi kesê bazdide re bazdidin ji bo wî kontrol bikin, ka bihna xwe berda ya na. Heger bihna xwe berda ew ê raweste û yekî din ji birra wî dewam dike. Heger birra Bê bi vî awayî gihiştin niqê (herdu keviran) bi ser dikevin û dibe dora wan ko li ber herdu keviran bin. Heger na her yek ji birra Ayê li kolîna kesekî ji birra Bê siwar dibe û dibe nik niqê.

Qaç, Tefş, Toş

Qaç (tefş) kevirekî(berekî) pehn e, bi qasî kefa destekî ye. Beşdarên vê lîstikê bi kêmanî ji 3 lîstikvanan in. Lîstikvanek (mak) li ber gogek piçûk (ji kevir e) dimîne, ew gog di orta giroverekê de ye. Berî lîstik dest pê bike her lîsikvanek qaçê xwe ji ber gogê davêje xêzekê (xêza ku lîstikvan qaç jê davêje goga piçûk, ji xêzê ta goga biçûk heye 5-6 metr), xweyê qaçê ji xêzê herî dûr dibe mak. Piştî mak te'yîn dibe dest bi lîstikê dikin. Her yek ji lîstikvanên din qaçê xwe davêje wê goga piçûk, hewl dide ku gogê ji groverê der û dûr bixe, heger bi ser ket wê here qaçê xwe bîne û vegere paş xêzê û herweha lîstikvanên din jî diherin qaçên xwe yên ku li gogê neketibûn tînin û vedigerin paş xêzê. Vêca dema gog ji girovera xwe der dikeve ew lîstikvan ê li ber (mak) wê vedigerîne cihê wê û hewl dide lîstikvanekî bigire berî lingê xwe dayne ser qaçê xwe(yanî lîstikvanên li nav xêzê û qaç). Heger lîstikvan lingê xwe danî ser qaçê xwe nabe mak (pawanê gogê) îşê xwe jê bîne. Ew kesê lingê xwe daniye li ser qaçê xwe li hêviya gog ji grovera xwe der bikeve dimîne ji bo karibe rahêje qaçê xwe û vegere xêzê. Ew kes ê ku lingê xwe daniye li ser qaçê xwe dikare bê ku destên xwe bi kar bîne qaçê xwe dayne li ser rûyê piyê xwe û bilind bike û bi destên xwe bigire, heger qaç ji destê wî ket ya nikaribû qaç bigirta firset ji pawanê gogê re dibe ko pey keve, wî berî bigihîje xêzê bigire. Bi girtina lîstikvanekî pawanê gogê rizgar dibe û yê girtî dikeve şûna wî.

Şepiya (goga) Qehfikan

Lîstik ji 8-11 qehfik, şepiyek (gogek, gelek caran ji paç û terîşan bû) biçûk (qasî şepiya tenîsê ye) û du birr lîstikvanan e. Xêzekê dikişînin û qehfikan datînin li ser hev. Xêz bi qasî 3-4 mitran dûrî qehfikan e. Heger birra Ayê li nik qehfikan bin ew ê Bê, yek bi yek şepiyê (gogê) bavêjin qehfikan, hewl bidin wan ji ser hev bixînin. Heger kesekî ji birra Bê qehfik nexistin ew ê herin têkevin şûna birra Ayê li ber qehfikan bimînin. Heger lîstikvanekî ji Bê qehfik bi şepiyê (gogê) ji ser hev xistin ew ê kesên Bê herin qehfikan daynin li ser hev, di vê demê de birra Ayê diherin pey şepiyê (gogê) dikevin, digirin û davêjin kesên birra Bê, û her kesek ji birra Bê şepî lê bikeve dişewite û ji lîstikê derdikeve. Heger birra Bê bikêrhatî bin û karibin qehfikan daynin li ser hev berî bişewitin bi ser dikevin û niqteyekê qazanc dikin, ya na ew ê têkevin şûna birra Ayê û bibin pawanên qehfikan.

Ferşanê, Tefşok

Lîstikvan ji xêzikekê ferşên(qaçên) xwe davêjin pakêtn(kerton, qutî) vala yên çixaran. Pakêtan di nava giroverekê de datînin li ser hev û niqteyan(piwan) didin her pakêtekê. Vêca her pakêtek ji giroverê derdikeve niqteyên wê didin xweyê ferş.

Eskerê heval-heval

Du birr dilîzin. Birra Ayê xwe vedişêrin û birra Bê diherin li wan digerin. Divê birra Bê hemû kesên birra Ayê bigirin ji bo bi ser kevin. Birra Ayê jî divê herin destên xwe li niqê bixin.

LÎSTIKÊN LI HUNDIR

Fincan

Zivistanê gundî bi vê lîstika ha li hundiran dilîzin. Du birr dilîzin. Birra Ayê 7 fincanan li ser dev li ser tebekekê datînin û gustîlkekê diêxin bin fincanekê ji wan 7 fincanan. Vêca birra Bê divê pê derêxînin ka gustîlk di bin kîjan fincanê de ye, heger cara yekê pê derêxistin hingê tebek dibe ya wan, yanî ew tebekê digerînin. Heger birra Bê rahişt fincana yekê bi mebesta gustîlkê û gustîlk ne di bin de bû deh niqte jj wan kêm dibin, lê dikarin xwe ji 10 niqteyan rizgar bikin (xwe bişon) dema karibin fincaneke din pûç bikin(bêjin ko gustîlk ne dibin wê fincanê de ye). Heger gustîlk di bin wê fincanê de derket 6 niqteyên din ji wan kêm dibin û birra Ayê ji nû ve tebekê digerîne.
Li hin deverên din bi awayekî hêsantir dilîzin. Birra Ayê 12 fincanan datînin li ser tebekê û birra Bê divê pê derxînin ka gustîlk di bin kîjan fincanê de ye, heger pê derxistin tebek dibe ya wan, ya na ew ê Birra Ayê dîsan tebekê bigerînin û niqteyekê qezenc dikin.

Gustîlk, gustîranê

Lîstika Gustîlkê jî hema hema wekî lîstika fincanan e. Endamê her birrekê palên xwe didin dîwarekî û beramberî hevudu rûdinên. Herdu birr li hev dikin ko sonda wan bi tiştekî be(li nik me bi Sobê bû). Sond ne bi Xwedê bû ji bo sonda wan dema ne rast derkeve li wan nekeve û gunehkar nebin. Birra Ayê dest pê dikin gustîlkê li nik yekî ji birrê vedişêrin, dema vedişêrin cilikekê yan perdakê bi ser xwe de dadikin û piştî gustîlkê vedişêrin wê cilikê yan perdê davêjin. Vêca birra Bê divê pê derêxînin ka gustîlk bi kê re ye. Birra Bê dikarin yekser texmîna xwe bêjin ko gustîlk bi sobê li nik X e. Heger rast derket birra Bê niqteyekê qezenc dikin û dibe dora wan, heger na birra Ayê niqteyekê qezenc dikin û careke din gustîlkê vedişêrin. Bi awakî din birra Bê dikarin kesên birra Ayê yek bi yek pûç bikin ta kesê gustîlk pê re ye dimîne.

Heftok, Pêncoke, Pêncokanê, Pênckevir, Delo

Kevirê lîstika Heftokê şayik, qasî xarekê biçûk e, lê ne wekî xarê girover e.
Gelek cûreyên lîstika Heftokan hene. Yek ji wan bi vî awayî ye:
Du kes bi 5 heftokan dilîzin. X dest pê dike, her pênc heftokan diêxe destekî û bi teliya mezin û ya nîşandanê heftokekê digire û davêje jor, bi avêtina wê heftokê her çarên din datîne erdê, divê heftok a li hewa berî bikeve erdê bigire. Heger ew heftok ne girt dişewite û heftokan dide Y. Ji xwe heger girt ew ê dewam bike û heftokê careke din bilind bike û bi avêtina wê re rahêje heftokekê ji her çar heftokên din û bi vî awî radihêje her çar heftokên xwe, pêşî yek û yek(bela), dido û dido(doko), sisê û yek(sêko) paşê her çar bi hev re(tepo). Paşê her pêncan bi hev re û bi her du destan davêje ser pişta destên xwe, nabe yek ji wan bikeve. Pişt re wekî destpêkê çar heftokan li erdê belav dike, tiliya nîşandanê ya destê din datîne ser ya ortê û bi tiliya mezin re kevanekî çê dike û datîne ser erdê (qilo) û yek bi yek bi avêtina heftokê ber bi jor ve heftokên din bi wî kevanî re derbas dike. Heger lîstik bê şaşî xelas kir cezayê Yê dibe Qirincok(meqesok), mîkutok û şiyatok. Y kefa destê xwe datîne erdê û X bi avêtina heftokê re qirincokekê ji pişta destê wî dide, û pişt re mîkutekî yanî bi kulma destê xwe lê dixe. şiyatok bi xwe ne ceza ye, lê piştî qirincok û mîkutan X pişta destê Yê miz dide.

Reci`, Lîstika şivanan

Du lîstikvan dilîzin. Du rêz kortik çêdikin, her rêzek ji 9 kortikan e. 95 reci` in. Reci` kevirek biçûk, şayik û rengîn e. Cilekekê davêjin bi ser kortikan de da ku reci` gemar ne bin. Her lîstikvanek bi 45 reci`an dilîze. Pêşî 5 reci`an diêxin her kortikekê û dest pê dikin reci`an bi dorê digerînin. Heger du reci` di kortikekê de bimînin dibin para yê ku reci`an digerîne. Herweha derdê her lîstikvanekî ew e ku nehêle firseta mayîna du reci`an di kortikekê de ji ê dî re çêbibe.

Girrê devan

Ev lîstik, wek lîstika navê a hêzê ye. Du lîstikvan xwe li ser erdê radimedînin, serê her yekî ji wan li alê linên ên din e. Her yek lingekî (eynê lingên, ê rastê yan jî ê çepê) bilind dike û herdu lingan li hev badidin. Vêca her yek hewl dide ku lingê ê din daxîne erdê.

Devoka Botan

Amadekar : Cemal ONURSAL

kurdî	tirkî	fransizî	îngilîzî
